Newroz Hejmar(67) Rûpel (16) Nîsan 2006z – 2618k

Roja jina Kurd

Ev babet , ji rêxistna jinan yên P.Y.D.S, li Helebê , ji roja 13 Gulanê , roja bîrhanîn û salvegera dilêra gelê Kurd , **Leyla Qasim Hesen** amede bûye û li pêş girseyek jinan li Helebê pêşkêş dibe.

Dîlan Zivingî

- Hevalên hêja, dost û hogirên delal !

-Win tev bi xêr li ser seran û herdu çavan hatine .

Roja -13- gulanê , pêdarî û dilsoziya jina kurd nîşn dide ku , çiqas girîng e mirov ji bo dozike rewa û dadimend, mîna doza gelê kurd ku ,ev miletê me yê ji bo bidesxistina mafên me kurdan weke her miletên azad û serbixwe , ji sedên salan ve xwe daye ser riya kar û xebatê . Ma kî nizane ku gelê kurd , di dîrok û şaristaniya mirovan de xwedî rol û dewran bû , ji emperetoriya **mîdiyan** ve bigire ra di dewileta dostikiyan re derkeve , wê bêgûman ev rastiya me li jor bi navkirî bi zelalî û aşkere di rûpelên dîrokê de xwe destnîşan dide ! . L belê , berjewendiyên nemirovane hêştin ku , di peymana **Seykis -pîko** de, li sala 1916an de, welatê me Kurdistan û di nav çar dewletên bêbexit Tirkiyê , Îraq , Îran û Sûriyê de hate dapeşkirin , sînorên tund û dijwar xistin navbera me kurdan û destên bav , bira , dayîk û xwîşkan ji hevdu dikirin .Vêca jî , ji wa rojê ve û ta roja me ya îro, gelê me yê kurd , mîna kesên biyanî , li ser xaka bav û kalan û di bin nîrên zor û setemên hovîtiya neyaran de , li ber xwe dide .

Ev yeka hanê, ji tevan ve diyar e ku, Kurdên me ji hemû mafên mirovane bê par in , li encama vê ton zorê setemê ; gelê kurd ji zû ve, li dîrok û zimanê xwe xwedî derdikeve , bi serkêşiya kesên xwedî bi rûmet ew pakrewan û nemirên mîna mile **Mistefa Berzanî** , **Şêx Se'îd pîranî , Seyd Riza , Qadî Mihemed** û h.w.d pir şoreş , tevger , serhildan , dezigeh , komele û h. w d avakirine. Zimanzanên mezin mîna C.Bedir-Xan, Q.Kurdo û Reşîdê Kurd bi holê ketin, zimanê Kurdî bûye xwedî pirtûk, kovar û rojname...

Xwîşk û birayên hêja !

Bêguman , rol û paya jina kurd , di serpêhatî û bûyerên reş de , tim û tim bêtir e. Ji ber ku , wê her dem bav , bira , mêr , zarî didan û bi xwe jî bûye qurban . Lê zor mixabin , rol û keda wê , di fergûna dawî de cih digirt, an jî bin cil û di tariyê de dima . Gelo , kî nizane ku , bi dehan navên jinên xwedî bîr û bawerî , ji bo doz û rûmeta netewa kurd , ew bi serbilindî bûne qurban , nimûne û mînak jî di vê warî de gelek in , nemaze dema navê **Leyla** li guhên mirov dikeve, wa hîngê tavidanê navê dilêra kurd ya nemir **Leyle Hesen Qasêm** , bi bîra mirov tê !. Ew keça xwendekar ku wê , tu carî êş û lêdana miletê xwe ji bîra nedikir û tiştên pûç û vala weke keçike kurd li ser xwe nedipejirand , herdem li nik xoritên kurd di astenk û serpêhatiyan de amede û alîkar bû . Wisan jî , wê di nêv refên parta demiqurasa kurdistanê de , bi serkêşiya nemir mile **Mistefa Berzanî** weke endameke çav bi çîk kar û xebat dikir , **D.R(15)**